DU HELBESTÊN WERGERANDÎ YÊN JAK PRÊVÊR

wergerandin ji Firansî: Enahita Hemo

1_ DEMA

DEMA şepal firavînê dixwe
Şêr ji nûve ciwan dibe
DEMA agir daxwaza para xwe dike
Xak ji nûve sor dibe
DEMA mirin li ser HEZKIRINÊ jêre diaxive
Jiyan bi tevaya xwe dilerize
DEMA jiyan li ser mirinê jêre diaxive
HEZKIRIN zeredeken dibe
DIMIZMIZE

2_ ÇENDÎ DARISTAN

Çendî daristan hatin hilkirin
Û birandin
Hatin hêrandin û gerandin
Çendî daristan bûn gorî û qurbanan
Bûna hevîrê Qaxezan
Bo miliyonên ROJNEMAN
Di her salê diyarbin
NIVISKAR: dipeyvin li ser
Li ser jêkirin û rûtkirina wan
DARAN